



ROJA KÛRDISTANÊ

BROŞÛR No. 3

**Em Rojava bi tenê Nehêlin
Bi alîkariyên xwe ve ambargoyê bişkînin**



**Rojava needs your help.
We break the embargo with your donation.**



Kurdî 3 - 17



Deutsch 18 - 33



English 34 - 44




Français 45 - 54



Türkçe 55 - 70



www.heyvasor.com



Êrîşên li dijî Rojavayê Kurdistanê û bêdengiya navneteweyî

Wek tê zanîn 15'ê Adara sala 2011'an di çarçoveya raperînên “Bihara Gelan” de ku li welatê Tunîsê destpê kiribû, gelên li Sûrî jî li dijî desthilatdariya Baas ya dîktator rabû serhildanê. Gelê Kurd yê li Rojavayê Kurdistanê ku rastî hewldanên qirkirin û siyasetên nijadperestiyê yên rêjîma Baas hatibû jî, ji bo bidestxistina mafên xwe yên rewşa bû yek ji hêzên herî çalak yên şoreşa Sûrî. Lê belê Kurd berovajî derdorên din û hêzên opozîsyonê, rêya şoreşa demokratîk û aştîyane hilbijart. Di encama têkoşîna her du salan de ku xwedispêre têkoşîna 30 salên dawî, îro li Rojavayê Kurdistanê gelê Kurd herêmên xwe azad kirin û bi dehan saziyên xwe yên sîvîl ava kirine. Dijminên gelê Kurd û hêzên xêrnexwaz yên xwe li destkeftiyên şoreşa Rojavayê Kurdistanê ranegirtin, ketin nava hewldanên kirêt.

8'ê Mijdara sala 2012'an bi hevkarîya dewleta Tirk komên çete ketin bajarê Serêkaniyê. Hêzên rêjîma Sûrî jî di bin navê şerê li dijî van koman, bi balafiran êrîşî bajarê Serêkaniyê kir û di encamê de bi dehan welatî jiyana xwe ji dest dan û bi sedan kes jî birîndar bûn. Ji ber êrîşên hêzên rêjîma Sûrî û komên çete, pêla koçberiyê destpêkir. Di nava çend rojan de, bêtirî 11 hezar mirov berê xwe dan Bakurê Kurdistanê. Komên çete yên sûd ji vê yekê wergirtin, dest bi talankirina xêr û bêrên bajarê Serêkaniyê kirin.





16'ê Tîrmeha 2013'an jî, komên binavê Cebhet El Nusra û Dewleta Îslamî ya Iraq û Şamê ku girêdayî rêxistina El Qaîdê ne, li herêmê Til Ebyed, Serêkaniyê û Çelaxa bi awayekî hovane êrîşî Kurdên sivil kirin. Ev komên ku li hemberî berxwedana gelê Kurd têk çûn, vê carê serî li rêbazên dij mirovahî dan.

Li gundê Til Hasil û Til Eranê yên girêdayî Helebê ku piraniya şênîyên wan Kurd, komên çete komkuji pêk anîn.

Di encamê de nêzî 100 welatîyên Kurd hatin kuştin û bi sedan kesî jî hatin revandin.

Li herêma Til Ebyedê jî, malên Kurdan bi temamî hatin talankirin û fetweya kuştina Kurdan û revandina jinan hat dayîn.



Êrîşên komên çete li hemberî vîna azad ya gelê Rojava nekarîn bibin asteng

Tevî hovîtiya van komên girêdayî El Qaidê jî, di serî de welatên Ewrûpa û Emerîka, komkujiyên li hemberî gelê Kurd tên kirin ji nedîtî ve hatin û bêdengiya xwe parastin.

Di rewşeke weha de Hukûmeta Herêma Başûrê Kurdistanê jî deriyê sînora yê Sêmelka li pêşiya alîkariyên mirovahî girt..

Li dijî vê helwesta herêma Başûrê Kurdistanê nerazîbûnên gelê Kurd li her deverê zêde bûn, lê li şûna ku hukûmeta herêmê bersîveke erênî bide daxwazên gel, deriyê Sêmalika tenê li pêşiya koçberiyê vekir.

Ji ber vê yekê di dawîya meha Tebaxê bi deh hezaran Kurd ji cih û warên xwe koçber bûn û vê gavê li wargehên Hewlêr û Silêmaniyê di nava şert û mercên giran de dijîn.

Tevî êrîşên hêzên rêjîma Sûrî û komên çete jî, gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê navber neda xebatên xwe yên rêxistinî.

Di vê pêvajoyê de xebata herî girîng jî, avakirina Saziya Alîkariya Mirovahî Heyva Sor a Kurdistanê bû.

Ji ber siyasatên şerxwaz yên rêjîma Sûrî ku rê li ber kuştina bi deh hezaran kesî û koçberiya bi mîlyonan vekir, 12'ê Kanûna sala 2012'an li bajarê Rojavayê Kurdistanê Amûdê bi tevîbûna komeke ji doktor û kedkarên tendurustiyê Saziya Alîkariya Mirovahî Heyva Sor a Kurd hat avakirin.



Di belavoka ragihandinê de sedemên avakirina Heyva Sor a Kurd weha hatin rêzêkirin:

“Li ser hîmê bawerîya me ya bi erka mirovahî û exlaqî, em komeke ji doktor û xebatkarên tendurustiyê ji bo em bibin pira veguheştina alîkariyên mirovahî ya ji bo mexdûrên şer, me biryar da ku saziya Heyva Sor a Kurd ava bikin. Ev saziya me bi temamî sîvîl e û ne girêdayî ti hêzên siyasî ye. Piştî ragihandina avakirina saziyê bi 5 mehan, angû 10'ê Nîsanê sala 2013'an Heyva Sor a Kurd yekemîn kongreya xwe li bajarê Qamişlo lidar xist.

Di kongrê de ji bo hevserokatiya Heyva Sor a Kurd Şehnaz Miho û Xelîl Sîno hatin hilbijartin.

Hin biryarên girîng yê hatin girtin jî ev bûn:

- Heyva Sor a Kurd wê li ser hîmê wîjdanî û mirovahî tevbigere.**
- Saziya me ji bo bicihanîna pêdiviyên welatîyên muhtac wê li her deverên Rojavayê Kurdistanê komîteyên xwe yê alîkariyê ava bike.**
- Li hemberî zêdebûna şer, kuştin û wêrankirinê, Heyva Sor a Kurd wê li hemberî rewşên awarte û lezgîn tedbîrên pêwîst bigre.**
- Li herêmên şer wê nexweşxaneyên mobîl werin avakirin.**

Di pêvajoya ku Heyva Sor a Kurd dest bi xebatên xwe yê rêxistinî kirî de, li taxên bajarê Sûrî Helebê Şêx Meqsûd û Eşrefiyê ku pîraniya şênîyên wan Kurd mezintirîn pêla koçberîya Kurdan destpê kir.

Di navbera 31'ê Adarê û 4'ê Nîsanê de herdu taxên Kurdan rastî êrîşên hovane yê hêzên rêjîma Sûrî hatin. Di encamê de bi dehan jin û zarok jiyana xwe ji dest dan û bi sedan kes birîn bûn. Ji ber dijwariya êrîşên rêjîma Baas bêtîrî sed hezara welatîyên Kurd ji neçarî berê xwe dan bajarên Efrîn û Kobanê.



Hêzên rêjîma Baas 13 Nîsanê jî cara yekemîn li hemberî gelê Kurd çekên kîmyewî bikar anîn. Wê rojê li taxa Şêx Meqsûd hêzên rêjîmê bombeyên gaza Siyanîd bi ser gel de barandin û di encamê de 2 zarok jiyana xwe ji dest dan û bi deh kes jî bi jehrî ketin.

Di nava çend rojên destpêkê yên pêla koçberiyê de, 300 dibistanên li bajarê Efrînê û navçeyên wê bûn stargehên welatîyan. Ji ner zêdebûna hejmara koçberan li her odeyeke dibistanê 25 kes hatin bicîhkirin.

Ne tenê Efrîn, her weha Kobanê û bajarên herêma Cizîrê jî bi deh hezaran malbatên mexûdrên şer û êrîşan himbêzkin.

Li gorî daneyên fermîn bi hezaran malbatên ku vê gavê koçberî Dirbêsiyê, Amûdê, Qamişlo û Serêkaniyê bûne, ji aliyê Malên Gel û saziyên girêdayî Tevgera Civaka Demokratîk Tev-Dem'ê ve li deverên ewle hatine bicîhkirin. Ji ber rewşa jiyane ya zehmet, cara yekemîn Saziya Elman "Arşê Nova" karwaneke alîkariyê derbasî Rojavayê Kurdistanê kir û ev alîkarî li bajarê Qamişlo û Kobanê li malbatên muhtac hatin belavkirin.

Li herêma di navbera Başûr û Rojavayê Kurdistanê de jî, ji ber sedemên siyasî Hukûmeta Herêma Başûrê Kurdistanê deriyê sînor girt û destûr neda ku alîkarî derbasî Rojava bibin. Her Lê di encama nerazîbûnên gel û hewldanên Desteya Bilind a Kurd de, hukûmeta Herêma Başûrê Kurdistanê neçar ma ku deriyê sînor ji bo derbaskirin alîkariyan veke.

Li Bakurê Kurdistanê jî, bi pêşengîya Şaredariyên BDP'î û rêxistinên civaka sîvîl, kampanya alîkariya Rojavayê Kurdistanê li her deverê hat destpêkirin. Di çarçoveya kampanyayê de, alîkariya herî bi wate û bi rûmet ji aliyê girtiyên siyasî yên Kurd ve hat kirin. Li gelek girtîgehên rêjîma Tirk bi sedan girtiyên Kurd xercên xwe yên rojane berhevkin û ji gelê Rojavayê Kurdistanê re şandin.

Şaredariyên BDP û rêxistinên civaka sîvîl jî, bi sedan tonên alîkariyên yên berhevkin di deriyê sînor yên Nisêbîn û Kaniya Xezalan derbasî Qamişlo, Serêkaniyê û Kobanê kirin.

Herî çendî kampanya alîkariyê ya li Bakurê Kurdistanê dewam dike jî, li ji ber rewşa jiyane ya li Rojava, pêwîstî pê heye ku gelê Kurd li çar aliyên Kurdistan û deriyê welatî bi rihê seferberiyê ji bo gelê Rojava têbikoşe û destê alîkariyê dirêj bike.

Kampanya HSK Ji bo Rojava û yê Kurdistanê

Sala 2012 û 2013 Heyva Sor a Kurdistanê ji bo gelê Rojava 2 kampanyayên alîkariya lezgîn birêve bir

Ji ber şer û êrîşên li Sûrî û Rojavayê Kurdistanê ku rê li ber kuştin, birîndarkirin û koçberiyê vekir, saziya Heyva Sor a Kurdistanê 2 kampanyayê alîkariya lezgîn destpê kir.

Di encama keda xebatkarên Heyva Sor û hestiyariya Kurdîstaniyên li Ewropayê, ev alîkarî ji bo gelê Rojavayê Kurdistanê re hat şandin.



- Milyonek û 500 hezar Euro alîkariya pereyan.
- 300 çadirên li dijî şewatê bi buhayê 106 hezar Euro ji bo malbatên koçber yên li Efrîn u Kobanê re hatin şandin.
- 35 Ambulans ji bo nexweşxaneyên Efrîn, Kobanê û herêma Cizîrê re hatin şandin.
- 10 ton Derman û 20 tonalavên tendurûstiyê ji bo nexweşxaneyên Efrîn, Kobanê û herêma Cizîrê.
- 140 ton şîrê Zarokan
- Ji bo 22.105 xwendekarên ku Rojava de dijîn re, bi buhayê 110.000 Euro alavên qirtasiye hate şandin.



JI PLATFORMA 21.KONGREYA HEYVA SOR A KURDISTANÊ YA ELMANYA `YÊ RE



**Di roja bi keder de, dostê te yê
herî nêz, Heyva Sor a Kurdistanê ye.**

**Am Tag der Kummer ist
„Heyva Sor a Kurdistanê“
dein nächster wahrer Freund.**

Mêvan û delegeyên hêja,

**Berî pêşkêşkirina rapora me ya xebatê, em we hemûyan bi rêz silav
dikin û bi xêr hatina we dikin.**

Hevalên hêja,

**Wek tê zanîn; Heyva Sor a Kurdistanê 31 Adar 1993 de li bajarê Elmanyayê
Bochumê hatibû damezirandin. Di ser damezerandina saziya me ve 20 sal
derbas bûn. Salvegera 21`an a damezirindina Heyva Sor a Kurdistanê li
gelê me û hemû xêrxwazan pîroz be.**



Beriya 20 salan komek maxdurên şer u parêzvanên mafê mirovan li ser hîmê zindîkirina jiyane dest bi projeya avakirina Saziya Heyva Sor a Kurdistanê kirin û heta roja me ya îro mohra xwe li gelek xebatên girîng û hêja dan. Di şexsê van hevalan de, em keda hemû xebatkarên saziya Heyva Sor ji dil û can silav dikin.

Xebatên me yê rêxistinî û piratîk:

Mêvan û delegeyên hêja,

Sazîya me di asta rêxistinîde, hem bêjin li hemû herêmên Elmanyayê xebatên xwe birêve dibe. Ev xebatên mirovahî bi hestiyariyeke mezin ji aliyê 135 kedkarên me ve tê birêvebirin.

Xebatên Sazîya me yê bingehîn jî ev in:

Komkirina alîkariyê bi rêya meqbûzan, qumbere, çêkirina endaman, pêşxistina pêwendîyan bi sazî û komelên mirovahî re û li gorî pêdiviyên kampanyayên alîkariyê.

Alîkariyên ku di encama xebatên me de tên berhevkirin, di serî de çar aliyên Kurdistanê, ji bo mirovên hewcedar tene şandin. Sazîya me herî zêde jî, alîkariyan dişîne herêmên ku şer bandora xwe li wan kiriye. Di heman demê de sazîya me destê alîkariyê dirêjî deverên ku felaketên xwezayî jî li wan rûda be.

Serlêdanên ji bo sazîya me tên kirin, bi awayekî berferêh tên lêkolînkirin û li gorî lezgîniya wan em hewl didin ku destên xwe yê alîkariyê dirêjî hewcedaran bikin.

Hevalên Hêja,

Prensîbên Xebata me:

1. Sazîya me peywendidare ji bo wan kesên hewcedarîya wan bi alîkariyê he ye û ew kesên ku dixwazin alîkariyê bidin.
2. Sazîya me li ser hîmê wekhevî û edaletê destê alîkariyê dirêjî her hewcedar dike.
3. Têkiliya me bi mirovan re li ser hîmê piştgirî û destekdayînê tê kirin.
4. Şopandina alîkariyên tîn dayîn
5. Divê mirovên me li ser hîmê dildarî û fedekariyê xebatan birêve bibin.

Projeyên me:

1. Projeya alîkariya zarokên bêxwedî, sêwî û yê malbatên belavbûyî.
2. Projeya ji bo bicîhanîna pêdiviyên tenduristiya gelê me yê di bin mercên gelekî dijwar de dijî.
3. Projeya alîkariyê ya ji bo girtî, mehkûm û malbatên wan.
4. Projeya alîkariyê ya lezgîn ji bo rewşên awarte.
5. Projeya hevpar ya xebata bi sazî û komelên hevsengî.
6. Projeya malbatên bira-xuşk.

Di bingeha van projeyan de, xebatên ku em dimeşînin ev in:

1. Heta îro; Bakur 245, Başûr 150 û Rojava 100 , bi tevahî ji 495zarokên me re alîkarî hate şandin. Her weha bi destpêka sala 2013'an de me alîkarîya mehane ji 50€'yî de derxiste 75€'yî. Her mehê 16.875 € alîkarî ji bo zarokan tê şandin. Ji ber ku ji vê şunda, li Rojava de alîkarîya ji bo zarokan ji alî Heyva sor Kurd ve bê kirin û her weha ji ber ku rewşa malbatên zarokên li Başûrê baş bûye, me di cih de dît ku alîkariya van her du beşan rawestînin.
2. Bi armanca piştgiriye her mehê 650 € ji bo Dayikên Aştiyê tê şandin.
3. Mexdûrên şer yê li di girtîgehên Tirkîyê de ne û ji bo alîkariyê serî li saziya me didin, li gorî derfetan daxwazan wan tîn bicîh anîn.
4. Di çalakîyên ji aliyên Kurdên Ewropayê ve pêk tîn, xizmetên tenduristî bi rêk û pêk tîn dayîn.
5. Ji malbata serokê mafên mirovan ê ku li Rojhilatê Kurdistanê
6. Xebatên me yê di çarçova projeya tenduristiyê de dihatin meşandin, didomin. Hatînên vê projeyê, li gorî pêdiviyên ji bo welat û deverên din tîn şandin.

7. Li Bakur de, lêcûnên çêkirina protezên kesekî hate şandin.
8. 40.000 Euro yên fitre û qurban ku hatibûn berhevkerin tevî 20.350 Euro alîkariya ji saziya me yanî bi gîştî 60.350 € ji gelê me yên Colemêrgê, Çelê, Geverê, Qilebanê, Şemzînanê û Bêşebabê re hat şandin.
9. Ji bo Cejna Qurbanê, 40.000 € ji gelê me yî Rojava re hate şandin.
10. Li Kurdistanê, ji bo malbatên hewcedar alîkariya lezgînin hate şandin.
11. Ji bo 25. hejmara weşana Saziya me kovara “Roja Kurdistan” 3000 heb hate çapkirin û ji endamên me û gelek deverên din re hate şandin.
12. Ji bo 4 welatiyên bi nexweşîya kanserê yên li Rojava her mehê 600 € alîkarî hate şandin. Ji vê şunda, ev alîkarî ji aliyê Heyva Sor a Kurd ve yê pêk bê.
13. Li malbatên 34 mirovên me yên li Roboskî'yê de hatibun kuştin re, 136.000 € alîkarî hate şandin.
14. Ji bo gelê me yên Rojava re, alîkariya pere, derman, kôn u ambulansan hate şandin.
15. Li Bajaroka Wanê Sixkê (Bostaniçi), bi buhayê 75.000,00 € pakêtên xwarinê hate belav kirin.
16. Ji Weqfa Jina a Hollandayê de ji bo çareserkirina Pêdiviyên zarokên malbatên feqîr ên Kurdistanê dixebite re, 12.000,00 € alîkarî hatê kirin.
17. Ji bo xebata pêşxistina têkiliya di navbera malbatên hewceyî alîkarîyê ne û malbatên ji bo bibin malabata bira-xuşk serî li dane, hewldan didomin.
18. Li Bakur, hin malbatên feqîr yên Sîyasetmedarên Kurd ku di girtîgehan de ne re, ji bo serdanîya zindaniyên xwe bikin, her meh 400,00 € alîkarî tê şandin.
19. *Ji bo çalakgerên gireva birçibûnê yên li girtîgehên Bakur û Tirkîyê re, bi buhayê 10.350,00 € vitamînen B1 hateşandin.*
20. *Heyva Sor a Kurdistanê ya Almanyayê, li Erwrûpa'yê de tevî 8 saziyên Kurd yên xebatên alîkarîyê dikin re Projeyên hevpar dimeşîne. Saziyên me ev in; Crossant Rouge Kurde (Fransa), Koerdiesche Rode Halve Maan (Hollanda), He ya Sora Kurdistanê (Swîsre), Kurdiska Röde Halvmanen (Swêd), Roja Sor a Kurdistanê (Avusturya), Koerdiche Rode Halve Maan (Belçîka), Kurdish Red Moon (Ingilîstan), Stöttenforeningen Mesopotamians Sol (Danîmark). Heyva Sor a Kurdistanê Almanyayê piştevanîyên girîng van saziyên me de girt.*
21. Bi armanca şopandina rewşa Rojavayê Kurdistanê di cîh de û di heman demê de ji bo belavkirina alîkariyan û parvekirina ezmûnên Heyva Sor a Kurdistanê, şandeyek çû serdana Rojava.
22. Ji bo Rojavayê Kurdistanê 7 Ambûlans hatin wergirtin, ji wan 2 ji bo Kobanê û Efrînê tevî cihazê Rontgen ku buhayê wê 150.000 €, cihazê EKG, cihazê Ultrason û alavên tendurustiyê hatin şandin.

23. Ji şopandina rewşa welatîyên hewcedar, şandeyek ji bo Başûrê Kurdistanê hatin şandin.

Kongreyê de rapora xebatê û rapora darayîyê hatê xwendin. Rêveberiya giştî hate îbra kirin. Kongre ji bo hîlbijartina reveberiya nû derbasî dengdanê bû. Encama dengdana veşartî û hejmartina vekirî de, Şemsettin Kara weke serokê nû yê saziyê û Mahmûd Emîn (Alîkarê Serok) , Murat Vargûn (Darayîvan), Hesên Dogan û Fettah Cerit Jî, ji bo rêveberiyê hatin hîlbijartin.

27.04.2013

Rêveberiya Giştî ya Heyva Sor a Kurdistanê

NIEDERKASSEL

Pirsgirêkên me yên rexistinî û pratîk:

Divê em di serî de diyar bikin ku serkeftina saziyekê rasterast bi serekftina xebata rêveberiyê ve girêdayî ye. Li gorî vê, ji hemû pirsdgirêkên rû didin rêveberiya me rasterast berpirsiyar e. Di civîn û planên rêveberiyê de ti pirsgirêkê girîng çê nebû ne. Lê belê di warê pratîkî de kêmasî derketine holê û ji ber vê yekê encamên ku hatibûn xwastin bidest neketin.

Wek mînak:

Tevî ku me gelek caran biryar da jî, lê me di mijara perwerdekirina xebatkarên de û her weha pêsxistina pêwendiyên bi saziyên mirovahî re, ti gavên berbiçav ne avêtin. Di bingeha projeyên hevpar de çanda xebata hevbeş nehatiye bidestxistin. Di mijara elaqedariya xebatkarên me bi mirovên alîkarîperwer re û her weha peydakirina endamên nû jî, gelek kêmasî rû dane.

Li aliyê din, li gel hîşyarkirina me ya gelek caran, pirsgirêkên kontoyên endamên me nehatin sererastkirin. Lewma saziya me îsal bêtirî 15.000,00 €'yî zerar kir.

Wek encam:

Di hemû xebatên me yên alîkarîyê, yên ku me heta îro meşandine de, piştgirên me, tenê gelê me yê fedekar û dostên wî bûn. Lê tevî hewldanên tîn kirin jî, heta nihat alîkarîyên hatine kirin, bersiva pêwîst nedane pêwîstiyên gelê me. Bê goman ji bo çareserkirina van pirsgirêkan divê em xebatên xwe 2 qat zêdetir bikin. Ji bo vê yekê, şert û mercên me çî dibin bila bibin û li ku derê dibe bila bibe, divê em hemû derfetên xwe yên heyî û hêza xwe bikin yek û ji bo bicihanîna pêwsîtiyên gelê me divê em bi rihê serfereberiyê tevbigerin.

Em diyar dikin ku em amade ne, bi her kesên dixwazin tevî van xebatên mirovahî û hûmanîter bibin re, bixebitin.

Hêvî û daxwaziya Heyva Sor a Kurdistanê ji xebatkarên xwe yên dildar ew e ku; mîsyona saziya me ya alîkar fêm bike, ji bo birayên xwe yên mexdûr bixebite, li dijî neheqîyê raweste, her tim li ba mexdûran cihê xwe bigire, xwe berpirsiyarê van yekan bibîne. Nixê ku her dildar derdixe holê hêja ne.

Hevalên Heja,

Ji bo alîkariya mirovên me, roj ew roj e ku em hêza xwe bikin yek.

Roj roja bersivdayîna mezlûmên ku çavên wan li rêya alîkariya me ne. Em dizanin tengasiyên wan pir in, lê divê em jî zanibin vê hêza xwe bi awayeke durist birêxistin bikin û seferber bikin.

Me hewl da ku em xebatên xwe yê di salekê de meşandibûn, pêşkêşî we delegeyên heja bikin.

Bê goman em zanin ku kêmasiyên me hene. Em bawer dikin ku platforma kongra me, wê rexne û pêşniyarên xwe bi pêş bixin û pêşkêş bikin.

Li ser hîmê vê hest û ramanê; em ji kedkarên fedekar ên HSK'ê re ku di xebatên sala 2012 de em tenê nehiştin re, ji endamên xwe yê heja re, ji dostên xwe re û ji sazîyên Kurdan ên ku di xebatên demên kampanyayên curbecur de alîkarî û piştgîrî dane me re, spas dikin û rêz û silavên xwe pêşkêş dikin.

27.04.2013

Rêveberiya Giştî ya Heyva Sor a Kurdistanê

NIEDERKASSEL



Prensîbên xebat û rêzicknameya me

- 1- Her xebatkarê Her Heyva Sor endamê saziya me ye û li herêma lê dimîne di asta yekemîn de ji xebatên saziyê berpirsiyar e.
- 2- Divê forma endametiya saziya me bi rêk û pêk were amadekirin. Yanî dive agahiyên pêwîst bi awayekî zelal werin nivîsandin. Divê xebatkarên saziya me jî, vê yekê di ber çavan re derbas bikin û şaşîtiyên heyî sererast bikin.
- 3- Jib o alîkariyên li herêman tîn berhevkerin bi awayekî saxlem bighêjin saziyê, xebatkarên ku van alîkariyan werdigrin di asta pêşî de berpirsiyar e.
- 4- Divê bi ti awayî rûpelên maqbûzên saziya me neyên guhertin û wendakirin. Ji wendakirina meqbûzan xwediyê wan berpirsiyar e. Bi ti awayî nayê qebûlkerin ku maqbûzên HSK ji bo xebatên din werin bikaranîn.
- 5- Divê mesrefên ku li herêman ji bo xebatên alîkariyê tîn kîrin bi haya komîteya maliyê ya saziya me bin. Eger bê haya komîteya maliyê mesref werin kîrin, wê ev yek ji kesê berpirsiyar were girtin.
- 6- Divê endamên saziya me yên navnîşan, adres û hejama telefonên xwe dugherin, buroya me agahdar bikin. Divê xebatkarên me di vê mijarê de her tim endaman hişyar bikin.



- 7 Qumbereyên saziya me divê ji aliyê 2 kesa ve werin vekirin û beramberê pereyên ji qumbereyan derkevin divê maqbûz were dayîn.
- 8- Divê alavên Saziya ji aliyê xebatkarên me ve werin parastin. Eger alav werin wendakirin divê kesên xebatkar bi yekê bi rêya raporê eşkere bikin.
- 9- Divê xebatkarên Heyva Sor tenê maqbûzên saziya me hilgirin. Divê mijarê de dive hemû xebatkar werin hişyarkirin.
- 10- Xwediyên dawetên ku naxwazên dezgeha alîkariya HSK were vekirin, dive destpêkê were qanikirin, eger nebû dive xebatkarên me ji salona dawetê derkevin.
- 11- Di çalakî û xwepêşandanên navendî de, dive her xebatkarên Heyva Sor li ber dezgeha saziya amade be û beşdarî xebatên alîkariyê bibe.
- 12- Divê her xebatkarên Heyva Sor rêbazên jiyanê xwe diqet bike û ji helwestên dijî jiyanê gelê me dûr bikeve. Divê neyê jibîrkirin ku çavên gelê me her tim li ser xebatkarên saziya me ne.





Palansaziya Heyva Sor a Kurdistanê a sala 2013'an

- 1- Ji bo pêşisitina pêwendiyên bi saziyên pêwendîdar re, wê komîteya HSK ya têkiliyan were avakirin. Divê endamê vê komîtê zimanên biyanî zanibin.
2. Divê her sale em ji sedî 20 hejmara endamên xwe zêde bikin. Li gorî vê yekê,
3. Divê li hemû qadên me yên xebatê, alîkariyên me yên maddî ji sedî 20 werin zêde kirin.
4. Ji bo danasîna kar û xebatên me, divê têkiliya bi çapemeniyê re were xurtkirin.
5. Divê xebatkarên saziya me were perwerdekirin.
6. Divê xebatên hevkar bi saziya Heyva Sor a Kurd li Rojavayê Kurdistanê were pêşxistin.
7. Divê salê 2 caran li Bakurê Kurdistanê pakêtên alîkariyê li malbatên muhtac were belavkirin.
8. Her salê wê kartên pîrozbahiyê, salname û buroşura derbarê xebatên saziyê de ji endaman re were şandin.
9. Her salê bi tevlibûna piraniya xebatkarên wê civîna saziyê ya berfereh were lidarxistin.
10. Divê maqûbûzên salane herî dereng 15'ê Çîlle werin komkirin û bi tevlibûna endamêkî malîyê, encamên wê werin radestkirin

BANG

EM BI XURTÎ BEŞDAR BIBIN KAMPANYA

BIBIN ENDAM Û BIKIN ENDAM

A KU HEYVA SOR A KURDISTANÊ DESPÊKIRI YE

**Navnîşan û Sazîyên Alîkarîyê yê
Kurdistanê de Ewropa da**

Avrupadaki Kürd yardım kurumları

Kurdische Hilfsorganisationen in Europa

The Kurdish aid Organization in Europe

Organisations Kurdes en Europe



HEYVA SOR A KURDISTANÊ

**E-Mail: heyvasor@web.de
Web: www.heyvasor.com**

Kreissparkasse Köln
Kontonummer: 40 10 481 Bankleitzahl: 370 502 99
IBAN: DE 49 370 502 99 000 40 10 481
BIC / SWIFT: COKSDE 33



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
KURDISH RED CRESCENT**

**Fairfax Hall 11 Portland Gardens
London N4 1HU
Registered Charity No: 1093741
Company No: 4285714
heyvasorakurdistan2012@gmail.com
Web: www.heyvasor.com**

Barclays Bank
Bank Sort code: 204660
Bank Account No: 40912387



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
Crossant Rouge Kurde**

**158 Avenue Charles Floquet
93150 Le Blanc-Mesnil, FR
Tel: 0033980884159
Web: www.heyvasor.com.fr**

Societe Generale
Bangue: 30003, Guichet 03947,
Code : 00037263155, Cle 39
IBAN: FR7630003039470003726315539
BIC/SWIFT: SOGEFRPP



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
KURDISKA RODA HALVMANEN-SW**

**Ankdammsgatan 24, 171 43 Solna/Sweden
Tel.: 0046 8 27 3685 Fax: 0046 8 27 3685
info@kurdiskarodahalvmanen.com
Web: kurdiskarodahalvmanen.com**

Nordea Bank
Post Giro: 22 8676-3
IBAN: SE1095000099603402286763
BIC/SWIFT: NDEASESS



ROJA SOR A KURDISTANÊ

**Jurek Gasse 26 / 1150 Wien
Tel: 0043 (0) 6606240462
rojasor@gmail.com
Web: www.heyvasor.com**

BAWAG Bank
Konto Nr: 03010314274
BLZ: 14000
IBAN: AT751400003010314274
BIC/Swift: BAWAATWW

**Stötteforeningen Mesopotamians Sol
Komela Alikariye Ya Roja Mezopotamya**



**Viktoriagade 16
1655 Kopenhagen
Tel: 0045 (0) 33 22 89 98**

Bank Danske
Reg. No.: 1551-1841084
IBAN: DK9530000001841084
BIC/Swift: DABADKKK



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
KURDISCHER Roter HALBMOND
KURDISH RED CRESCENT
www.heyvasor.com**

Bankverbindung:
Post giro: Ccp: 8-17192-8



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
STICHTING KOERDISCHE HALVE MAAN**

**Postbus 2136 5202 CC 's-Hertogenbosch
heyvasorhollanda@hotmail.com
Web: www.heyvasor.com.nl**

Ing Bank N.v.
Giro No: 746 06 93
IBAN: NL80INGB0007460693
BIC/SWIFT: INGBNL2A



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
KOERDISCHE RODE HALF MAAN
Crossant Rouge Kurde**

Bankverbindung:
Post giro: Ccp: 8-17192-8



**Rojava braucht Hilfe. Brechen wir
das Embargo durch Ihre Spenden.**



**Rojava a besoin d'aide
Nous brisons l'embargo par des dons**